Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 926 22-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Kurdistan Zendî: Pilegirtina li ser navê welatê xwe wê min pirtir serbilind bike



**Werzişvan Kurdistan Zendî ya ji ber zordariya rejima Îranê koçî Tirkiyê kiriye û di asta cîhanê de 2 caran pileya yekê ya di qada werzişê de girtiye, dixwaze ji bo paşrojê bigihîje asteke bilindtir. Kurdistan da zanîn ku li hemberî wê astengiya penabertiyê heye û pêwîst e bi wesîleya werzişa aştiyane jê re derfet werin afirandin.**

Kurdistan Zendî ya 13 salî, ji ber zextên Rejîma Îranê ya li ser malbata wê dihat kirin neçar dibin ku koçî Tirkiyeyê bibin. Kurdistan li Tirkiyeyê di asta werzîşê ya beşa Kung Fuyê de bi perwerdeya ku ji bavê xwe Ebbas Zendî digire serkeftinên mezin bi dest dixe. Di asta navneteweyî de 2 caran pîleya yekemîn digire. Lê belê ji ber rewşa penabertiyê Kurdistan nikare derkeve derveyî Tirkiyeyê û li wir beşdarî pêşbirkên navneteweyî bibe. Kurdistan dixwaze ev astengî were rakirin û ji bo cîhanek aştiyane werzîşa xwe bike. Her wiha navê Kurdistanê jî li Tirkiyeyê wekî Kardestan ketiye qeydan.

**Bi koçberiyê re çavên xwe vedike**

Kurdistan Zendî li bajarê Sîneyê yê Rojhilatê Kurdistanê ji dayik dibe. Bavê wê Ebbas (Şoreş) Zendî jî di beşên werzîş, nivîskarî û şêwekariyê de bi awayekî pispor dixebitî. Mamostetiya werzîşê dike, pêşengehên wêneyan vedike û di gelek pirtûkên weke "Demsal, Xweda li ku ye, Segê Reş û Şivan, Mişk û Pişî" û weke din dinivîse. Ango perwerdeya ku dida jî bi zimanê Kurdî dida. Lewra Rejîma Îranê ya ku li ser Rojhilatê Kurdistanê desthilatdariya xwe dide meşandin weke gelek kurdên din dest dirêjî jiyana malbata Zendî jî dike. Sedemên vê perwerdeya zimanê Kurdî, hunermendî û nivîskariya kurdî bû. Abbas bi caran tê girtin û di îşkenceyên giran ên rejîmê de derbas dibe. Herî dawî dikevin ferqê ku jiyana wan di metirsiyê de ye û koçî Tirkiyeyê dibin. Di serî de penaberê Stenbolê ne û ji wir jî tên bajarê Manîsayê.

**Bi penaberiyê re jî pirsgirêk dewam dikin**

Dema ku malbata Kurdistan penaber dibe ew hîna zarok e û bi rêwitiyê re çavên xwe li jiyanê vedike. Mixabin pirsgirêkên ku dijîn bi vê yekê re sînordar namîne. Kurdistan ji ber navê xwe û penabertiyê jî rastî astengiyên mezin tê. Li Manîsayê bi zimanekî biyanî dest bi dibistanê dike. Hevalên wê çênabin, lê belê di dibistanê de her tim bi serkeftinên ku bi dest dixe balê dikişîne ser xwe. Ji ber navê xwe tê dûrxistin an jî navê wê şaş tê gotin lê ew tucarî ji navê xwe aciz nabe, li dijî wê bi hezkirin navê xwe dibêje. Hîna di wan çaxan de jî bêhtir xwe dide werzîş û dibistanê. Bi armancên mezin moral dide xwe û xelatên mezin bi dest dixe.

**Bi xelatên navneteweyî serkeftinên xwe mezintir dike**

Kurdistan heta niha di beşa werzîşê ya Kung Fuyê de gelek xelat girtiye. Di asta cîhanî de 2 xelatên zêr û di asta pêşketina Kung Fuyê de jî du car pîleya yekemîn distîne. Li Manîsayê jî 3 xelatan digire. Her wiha ji bo pêşbirkên navneteweyî yên li Bûlgarîstanê hatine destpêkirin de jî daxwaz dikin ku Kurdistan jî beşdar bibe. Lewra ji ber rewşa penabertiyê ew nikarin derkevin derveyî Tirkiyeyê û beşdarî pêşbirkan bibin. Ev jî li hemberî Kurdistan dibe astengek mezin.

**'Pilegirtina li ser navê welatê xwe wê min pirtir serbilind bike'**

Kurdistan têkildarî werzîş û armancên xwe ev gotin kir:"Ez jî dixwazim ji bo aştiyek cîhanî di beşa werzîşê de li ser navê welatê xwe pîleyê bigirim. Werzîş min pir şa dike ku ez xwe pê azad dibînim. Pîlegirtina li ser navê welatê xwe dê min bêhtir serbilind bike. Ez hêvî dikim ku derfet bêhtir werin dayîn ku em bikaribin xwe pêşdetir bibin. Ez dixwazim di beşa werzîşê de asta xwe bilintir bikim û bibim yek ji werzîşvanên herî pêşketî. Ez hemû kurdan silav dikim û hêviya min ew e ku di demên azad de kar û xebatên xwe bidim meşandin û navê xwe bi awayekî azad bikaribim bêjim."

**'Bila zarok bi azadî perwerdeyê bibînin'**

Bavê Kurdistan Ebbas Zendî ku di heman demê de mamostetiya wê dike dibêje Kurdistan rastî astengiyan tê û pêwîst e hemû zarok bi awayekî azad werzîşê bikin. Ebbas wiha diyar kir: "Armanca werzîşê aştiya navneteweyî ye û pêwîst e hemû zarok xwediyê mafên beşdarbûna çalakiyan bin. Dil dixwaze ku ez gelek zarokan weke Kurdistan perwerde bikim û bigihînim astên bilind."

***JINHA***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Bûro (Fransî) | Nivîsgeh, odeya xebatê, ofîs. |
| Bûrokrasî (Fransî) | 1.Koma rêveberên dewletê yên asta wan li jorê. 2.Meşandina karê rêveberiyê: Ji ber bûrokrasiya giran plana me nemeşiya. |
| Fermanber | Kesê di karê dewletê de bi mûçeyê dixebite, memur, mûwezef. |
| Fon (Fransî) | Diravên ji bo bikaranîna kareki diyar hatîn cudakirin, çavkanî: Ji bo piştgiriya mamosteyan fon hat veqetandin. |
| Kargeh | Ciyê ku kar lê tê kirin. Paloke, fabrîqe, memele. |
| Karmend | Xwediyê kar, karbidest. |
| Moçik | Tasa ji dar hatî çêkirin. |
| Mûçe | Mehaneya ji bo kesên kar dikin tê dayîn. Meaş. |
| Nakokî | Tiştên dijberî hev: Di navbera wan de nakokî derket. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | ■ | R | A | ■ | A | Z | A | D |
| 2 | R | E | ■ | F | E | ■ | O | J | E |
| 3 | D | ■ | X | E | ■ | Î | ■ | O | ■ |
| 4 | ■ | J | ■ | T | E | Ş | Î | ■ | E |
| 5 | K | Ê | L | ■ | L | ■ | S | R | Y |
| 6 | I | ■ | A | T | Î | N | A | ■ | A |
| 7 | Ş | O | P | ■ | F | A | ■ | A | R |
| 8 | ■ | D | A | N | ■ | N | A | L | ■ |
| 9 | X | E | Z | A | L | ■ | D | A | D |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 3 | ■ | | | | ■ | | ■ | | |
| 4 | | ■ | | ■ | | | | ■ | |
| 5 | | | | | | | ■ | | |
| 6 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 7 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 8 | | | | | ■ | | | | |
| 9 | | ■ | | | | | ■ | | |

### ÇEP-RAST

1. Rengek... Di dîrokê de dewleteke Kurdan
2. Ji vir û şûn de, ji niha pê de... Baneşana bêhntengiyê
3. Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê
4. Birayê diya mirov
5. Mehek... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tinekirin
6. Alif, xwarina sewalan... Herf
7. Jinên ku bi heman mêrî re zewicîne
8. (Ehmedê …) Nivîskarê pirtûka 'Mem û Zîn'ê... Mektûb
9. Çong... Nexweşiyek

### JOR-JÊR

1. Notayek... Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Pevdenga kurdî
2. Tinekirina giştî
3. Kesê ku rê nîşan dide... Bi erebî "ez"
4. Bi rûsî erê... Tiriyê ku li ber tavê hatiye hişkkirin
5. Notayek... Kurtebêja Ksenonê
6. Di lîstikê de dor... Ne kevin
7. Notayek... Pêxemberek
8. Notayeke mûzîkê... Birayê bavê mirov... Pirç
9. Genimê hêrayî... Rengek




## Fikrê Rêbertiyê ji tevayiya gelên bindest re riya rizgariyê ye

Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku fikrê Rêbertiyê ji tevayiya gelên bindest re riya rizgariyê ye û gotin, emê têkoşîna xwe heta azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan bidomînin. ***R-4***

## Gelên herêmê wê li hemberî dagîrkeran serî daneynin

Ebdulhadî Ehmed: "Dewleta tirkî ya dagîrker bi gef û êrişên ser gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, dixwaze temenê desthilatdariya xwe dirêj bike." ***R-4***




Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 926 22-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Dayîkên şehîdan: Mesûd Barzanî pêşwaziya dagîrkeran dike lê nameyên me red dike

Dayîkên şehîdan diyar kirin ku pêşwazîkirina serçeteyên Efrîn dagîr kirin li başûrê Kurdistanê ji aliyê Mesûd Barzanî ve nayê qebûlkirin û gotin, dema me xwest nameyekê radestî wan bikin, red kirin lê ji bo pêşwazîkirina dijminan amade ne. *R-2*




# PDK'Ê HER DU DERÎ JÎ LI SER ROJAVA GIRTIN



Kurdewarî û girtina deriyan li dijî hev in
Kurd çawa dikarin deriyan li ser hev bigirin?
Ka biratî, ka kurdayetî, ka welatperwerî?
Hûnê sibê bi çi rûyî li çavên Kurdên Rojava binêrin?
Şerma herî mezin girtina derî li rûyê bira ye.

Berî niha bi çend rojan bi egera çalakiya li ser pirê, PDKê ji aliyê xwe ve deriyê Pêşxabûr li ser rojavayê Kurdistanê girt. Piştî du rojan deriyê El Welîd jî girt. Çawa ku tê zanîn jixwe ev deh sal in Rojava di binê dorpêçê de ye. Deriyên di navbera Başûr û Rojava de mabûn, PDKê ew jî girtin. Welatiyên rojavayê Kurdistanê vê kiryara PDKê bi cezakirin, dorpêçkirin û daxwaziya fetisandina gelê Rojava bi nav dikin û şermezar dikin.

## Sîstema işkenceyê ya girtîgehên dewleta tirkî ku bi faşîzmê tên birêvebirin, polîtîkaya qirkirinê ye



Rejima AKP-MHPê rojbiroj polîtîkayên xwe yên qirkirinê bi taybetî li girtîgehan, dijwartir dike. Parlamenterê HDPê got, rejima AKP-MHPê bi ser girtiyan de sîstemeke işkençeya derûnî û fîzîkî disepîne û girtîgeh bûne navendên faşîzm, tolhildana siyasî, kuştin û qirkirinê. ***R-5***

## Komîteya Tenduristiyê ya Dêrazorê banga xweparastinê ji vîrûsa korona kir



Hevserokê Komîteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Sivîl ya Dêrazorê Mihemed El-Salim diyar kir ku guhnedana tedbîrên pêşîlêgirtinê, bû sedema zêdebûna jimara nexweşên vîrûsê. Herwiha bang li welatiyan kir ku tedbîrên parastinê bigirin. R-6

## Edhem Omer: "Rakirina destana Derwêşê Evdê ji materyalên perwerdeyê xizmeta dijmin dike"




Endamê Navenda Çand û Hûner ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo Edhem Omer diyar kir ku rakirina destana Derwêşê Evdê ji materyalên perwerdeyê yên başûrê Kurdistanê, li ser daxwaziya dijmin e da dîrok û çanda Kurdan bihelînin û got, 'eger îro destana Derwêşê Evdê rakirin wê sibê zimanê kurdî jî qedexe bikin." R-7

## Li Kobanê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan konê çalakiyê



Bi armanca rakirina tecrîda li ser Rêber Ocalan û xwesteka pêkanîna azadiya wî ya fîzîkî, li Qada Şehîd Egîd ya li navenda bajêr ya Kobanê konê çalakiyê hat vegirtin. ***R-3***

## Piştî deriyê Pêşxabûr, PDK`ê deriyê El-Welîd jî girt





PDK`ê roja Yekşemê serê sibê deriyê El-Welîd yê girêdayî başûrê Kurdistanê û li hemberî deriyê Siwêdiyê yê herêma Koçeran ya girêdayî Dêrikê, girt ***R-3***

## QSD: Çapemeniya hikumeta Şamê nûçeyên derew belav dike

QSD`ê ragihand ku idîyayên dezgehên çapemeniyê yên girêdayî hikumeta Şamê yên têkildarî qaşo operasyonên QSD`ê li dijî sivîlan li gundewarê bakurê Dêrazorê derew in. ***R-3***

## 'Armanca me xurtkirina têkiliyan bi tevayiya rêxistinên jinan re ye'



Endama Desteya Rêveber ya Nûnertiya Kongreya Star ya başûrê Kurdistanê Silava Silêman diyar kir ku armanca hevîdtinên wan yên bi rêxistinên jinan yên başûrê Kurdistanê re ew e ku têkiliyan bi jinên Kurd û jinên li ser asta herêmî û cîhanê de xurt bikin. ***R-2***

# Dayîkên şehîdan: Mesûd Barzanî pêşwaziya dagîrkeran dike lê nameyên me red dike

Dayîkên şehîdan diyar kirin ku pêşwazîkirina serçeteyên Efrîn dagîr kirîn li başûrê Kurdistanê ji aliyê Mesûd Barzanî ve nayê qebûlkirin û gotin, dema me xwest nameyekê radestî wan bikin, red kirin lê ji bo pêşwazîkirina dijminan amade ne.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Eşkere bû ku serokê PDK'ê Mesûd Barzanî li başûrê Kurdistanê pêşwaziya şandeya qaşo 'Meclisa Sivîl ya Efrînê' ya girêdayî dewleta tirkî ya dagîrker kiriye û pê re hevdîtinek pêk aniye.
Têkildarî mijarê dayîka bi navê Şemsîxan Gulo diyar kir ku nêzî heştî rojî ye, em li deriyê sînor yê Sêmalka ne û em daxwaziya girtina cenazayên gerîlayan dikin û wiha got: "Em dixwazin nameyekê bigihînin PDK'ê, lê me red dikin. Me 4 caran hewl da lê pêşwaziya me nekirin".
Şemsîxan Gulo wiha got: "PDK pêşwaziya dijmin tenê dike, ji nedayîna cenazeyên şehîdan diyar dibe ku bi dewleta tirkî re hevkariyê dike. Mesûd Barzanî bi çeteyên Efrîn dagîr kirîn re hevdîtinê dike, lê ne amade ye nameyekê ji dest me bigire".



Şemsîxan da xuyakirin ku vê hevdîtinê normal nabînin û wek xiyanet bi nav kir. Şemsîxan Gulo pêşwazîkirina serokê berê yê 'Itîlafa Sûriyê' Nesir El-Herîrî jî bi bîr xist û got, çawa pêşwaziya me nakin! Em dayîk in û kezeba me dişewite.

**DESTÊ PDK`Ê DI DAGÎRKIRINA HERÊMÊN ROJAVAYÊ KURDISTANÊ DE HEYE**

Şemsîxan Gulo da zanîn ku dema xwestin nameya xwe bigihînin PDK`ê ji bo dayîna cenazeyên şehîdan, li ser sînor bi danûstandinan nexweş re rûbirû mane û wiha şîrove kir: "Bêhna kurdayetiyê ji nîqaşên wan nedihat. Mirovên pêşwaziya dagîrkeran bikin dibin hevkarên dijimin. Wê demê destê PDK`ê di dagîrkirina herêmên rojavayê Kurdistanê de jî heye. PDK li her deverê rewabûnê dide êrişên dewleta tirkî ya dagîrker. Rojekê me daxuyeniyeke şermezarkirinê jê nedîtiye"

**BI GIRTINA DERIYÊ PÊŞXABÛRÊ PDK DIXWAZE ROJAVA DORPÊÇ BIKE**

Şemsîxan Gulo bal kişand ser girtina deriyê sînor yê Pêşxabûr ji aliyê PDK`ê ve û wiha got: "PDK ne bi destê xwe ye, dixwaze wekî Peymana Lozanê bike. Bi vê dibêje ezê rê li ber Rojava bigirim û dorpêç bikim. Lê derî li ber Rojava nayê girtin. Gelê Rojava dizane debara xwe bike."
Sibeha 16`ê Kanûnê, PDK`ê deriyê sînor yê di navbera başûr û rojavayê Kurdistanê de li aliyê Pêşxabûr girt.
Şemsîxan Gulo bîr xist ku sala 2014`an PDK'ê di navbera başûr û rojavayê Kurdistanê de xendek kolan û wiha got: "Em wek gel em li dijî wan xendekan derketin, me got bila destê biratiyê ji hev qut nebe û xewnên dijminan pêk neyên. Piştî wê dîwarê şermê danîn. Îro jî dergeh bi temamî di-



girin. Bi vê tişta ku dewleta tirkî dixwaze pêk tînin.
Li aliyekî din dayîka bi navê Fatima Xelîl jî da zanîn ku pêşwazîkirina dagîrkerên Efrînê ji aliyê Mesûd Barzanî ve, tê wateya alîkariya bi dewleta tirkî ya dagîrker re. Fatima Xelîl wiha got: "Em dayîkên şehîdan naxwazin kiryar bigihîjin asta ku kêfa dijimin xweş bibe. Em dixwazin PDK li xwe vegere û êdî bes e jê re."

# 'Armanca me xurtkirina têkiliyan bi tevayiya rêxistinên jinan re ye'

**Endama Desteya Rêveber ya Nûnertiya Kongreya Star ya başûrê Kurdistanê Silava Silêman diyar kir ku armanca hevîdtinên wan yên bi rêxistinên jinan yên başûrê Kurdistanê re ew e ku têkiliyan bi jinên Kurd û jinên li ser asta herêmî û cîhanê de xurt bikin.**

Nûnertiya Kongreya Star ya başûrê Kurdistanê hewl dide têkiliyanên xwe yên dîplomasî bi rêxistinên jinan ên li Başûrê Kurdistanê xurt bike da ku deng û rengê jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku nûnertiya şoreşa dikin, bighîne derve.
8`ê Kanûnê, Nûnertiya Kongreya Star ya li başûrê Kurdistanê serdana Saziya Jiyan a Mafên Mirovan, Rêxistina Xanzad a Çand û Civakî û Rêxistina Dabîn a Geşkirina Demokratîk û Mafên Mirovan kirin.
Şandeya Kongra Star ji rêveberên Kongra Star Lêman Şiwêş, endamên desteya rêveber a nûnertiyê Silava Silêman, Dilvîn Ehmed, nûnera Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Nûrşan Hisên û endama desteya rêveber a nûnertiya Rêveberiya Xweser Ziheya Al Reşî pêk dihat.
Têkildarî armanca serdanan û nîqaşên ku hatine kirine endama Desteya Rêveber a Nûnertiya Kongra Star a li Başûrê Kurdistanê Silava Silêman pirsên me bersivandin.
Hevpeyvîn wiha ye:
Ev demek e Kongra Star di aliyê dîplomatîk de bi rêxistinên jinan re di nava pêwendiyê de ye û serdanan li ser asta herêmî û navneteweyî pêk tîne. Gelo hûn dikarin me têxin çarçoveya nîqaşên ku di navbera we û aliyên ku hûn ji aliyê wan ve hatin pêşwazîkirin de?
Destpêkê, Komîteya Têkilî û Lihevkirinên Demokratîk yek ji komîteyên Kongra Star e ku di sala 2013`an de hate avakirin.



Xwezaya xebatê komîteyê li ser esasê avakirina têkilî û hevaltiya bi rêxistin û kesayetên jin, siyasetmedar, rêxistinên civaka sivîl, civakên ku banga azadî û demokrasiyê dikin e da ku reng û dengê şoreşa jinê ya Rojava- Bakur û Rojhilatê Sûriyê bighîne derve. Şoreşa jinê û berdêlên ku jinan li hember hêzên tarî dane, bi efsaneyên xwe yên lehengiyê li ser asta cîhanê tê naskirin.
Projeya neteweya demokratîk ku alternatîfa pergalên desthilatdar û dewletên neteweperest in, bi nûnertiya hemû pêkhate, mezheb û nijadan bi Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê modeleke xweser a demokratîk a bêhempa ye. Taybetmendiyên herî girîng ên vê projeyê rola aktîv a jinan di rêveberiyê de, sîstema hevseroketiyê û beşdarbûna jinan di avakirina biryar, jiyana siyasî û civakî de ye. Di vê projeyê de rêjeya beşdarbûna jinan di tevahî deste û rêveberiyan de ji sedî 50 ye. Ji wê zêdetir rola wan di qada siyasî, dîplomasî û leşkerî de sereke ye.
YPJ`ê li hemer xetertirîn rêxistinên terorîst di cîhanê de şer kir. Wekî nûnertiyên Kongra Star ên li derve, di nav de nûnertiya li Başûrê Kurdistanê, parastina destkeftiyan û ragihandina rastiya têkoşîna jinan ji derve re erkên me yên sereke ne.
Ji ber vê yekê bi dehan kesayetên jin hatin herêmê da ku vê tercrûbyê nas bikin û sûdê jê bigirin.
Gelek kesayetên jin ên enternasyonalîst tev li YPJ û gelek saziyên jinan li Rojava bûn da ku vê tecrubeyê bibin welatê xwe û bi vê yekê ev destkeftî bibin mîrata têkoşîna jina azad li ser asta cîhanê. Her wiha Kongra Star dixebite da ku têkiliyên hundirîn xurt bike. Em hewl didin xwe bighînin her jinek li Sûriyê û li ser asta Rojhilata Navîn. Ji ber ku divê asoyên vê tecrubeyê berfireh dibin ku karibe civakê bi rêve bibe û sîstemeke demokratîk ji Rojhilata Navîn re ava bike. Ji ber wê jî têkoşîna hevbeş dikare guhertinan pêk bîne û dikare hemû baweriyên paşketî biguherîne. Ji ber ku doza jinê li sera asta cîhanê yek e. Sûdgirtina ji tecrubeyan ji bo me pir girîng e. Lew re hevdîtin têne kirin û beşdarbûna di kongre, penelên jinan li ser asta herêmî û cîhanî tê kirin. Li ser vî esasî nûnertiyên Kongra Star li Başûrê Kurdistanê, Lubnan û Ewropayê hatin vekirin.
Wekî ku min berê jî gotiye, danasîna mekanîzmeya xebatê ya Kongra Star û nimûneya wê, çawaniya rêxistinkirina jin di nava komîn, meclis, akademî, kooperatîf û komîteyên girêdayî wê de, zehmetiyên ku di nava şoreşê de rastî jinan tên, rola girîng û pêşeng a jinan di pêkanîna nimûneya demokratîk û parastina jîngeh û azadiya zayendî de bingehîn nîqaşên me ne. Her wiha rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê di hevdîtinên me de tên nîqaşkirin.
Li aliyekî din jî belgekirina sûcên ku li dijî jinan bi giştî û yên li herêmên ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatine dagirkirin erka me ye. Her wiha em bala cîhanê bikişînin ser rewşa jinan li herêmên me, dosyayên belgekirî radestî aliyên pêwendîdar bikin da ku zextê li civata navneteweyî bikin û hesab ji sûcdaran bixwazin, destekê bidin projeya ku em banga wê dikin û ew jî neteweya demokratîk e.
We li Başûrê Kurdisetanê serdana rêxistinên jinan kir, hûn dikarin rewşa jinan bi giştî û destkeftiyên ku li wir bidest xistine binirxînin?
Nabe em rewşa jinan li parçeyekê bêyî ya din binirxînin, ji ber ku doza jinan yek e û zihnetiya ku jinan dike hedef li her derê yek e, lê rêbaz cûda ne. Hîna tundî li ser jinan tê kirin, li ser vê yekê pêşxistina xebata hevbeş girîng e.
Kongra Star dibîne ku berpirsyariya wê ya dîrokê avakirina yekitiya neteweyî li ser asta Kurdistanê ye û divê bi awayekî aktîv beşdarî xebatên avakirina yekitiya neteweyî di navbera hemû hêzên siyasî yên kurdî de bibe. Di heman demê de ji bo têkoşîna hevpar û yekitiya neteweyî bi hemû rêxistinên jinan ên Kurd re bixebite da ku karibe bandorê li biryara siyasî bike ya ku daxwazên gel bêyî ketina li pey berjewendiyên partiyetî yên teng ên ku xizmeta doza kurdî nake, bi cih bîne. Beşdarbûna Kongra Star di kongreyên neteweyî yên yekemîn û duyemîn ên jinên Kurd de ku li Bakur û Başûrê Kurdistanê hatibûn lidarxistin çakakî bû. Niha di komîteya amadekar a lidarxistina kongreya duyemîn de dixebite.
Dixwazim îşaretê pê bikin ku nûnertiya Kongra Star a li Başûrê Kurdistanê nûnertiya yekemîn a Kongra Star e ku li derveyî Rojava hate vekirin. Armanca wê jî ku nêzîkatî di nêrînên jinan li ser asta Kurdistanê de çêbibe û sûdê ji tecrubeyên hev bigrin, her wiha sînor ji tundiya li dijî jinan re daynin. Ji ber ku doza jinan yek e û çi jina ku rastî tundiyê tê em xwe berpirsên vê yekê dibînin. Ji ber wê jî weke nûnertiyê beşdarbûneke me ya çalak di hemeleyên li dijî tundiya li ser jinan de û xebatên ku tundiyê kêm bikin bi rêxistin û saziyên jin li Başûr re heye.
Gelek şandeyên jinan ên ji Başûr serdana Rojava kirin, her wiha tev li pêngavên jinan ên piştevaniya şoreşa Rojava û parastina wê bûn.

Di van serdana de we çi bidest xist, gihaştin çi û di dawiya serdana de we îşaret bi çi kir?
Doza jinê yek e, girîngiya pêşxistina têkiliyan û berdewamiya pêwendiyê, xurtkirina xebatê hevbeş erka me teva ye. Herî dawî jî gelek hevdîtinên me bi rêxistinên jinan ên li Başûr re hebûn. Di wan hevdîtinan de teqezî li ser vê xalê hate kirin; em hemû ji bo bidestxistina mafên xwe, xurtkirina têkiliyan, pêşxistina derfetan, parastina destkeftiyan, peydakirina ewlehiyê ji jinan re da ku li hember hemû zehmetiyan bisekine, rêxistinkirina jinan di nava civakê de, têkoşîna li hember hemû cûreyên tundiya li ser jinan, girîngiya beşdarbûna jinan di biryargirtinê de tê dikoşin. Jin li Rojava li dijî rêxistina terorîst a DAIŞ`ê şer kir. Em şerê fikirên radîkal û hemû fikirên jehirkirî ku jinan dûrî mafên wê dixe, dikin. Armanca me îro xurtkirina têkiliyên di navbera jinên Kurd û jinên li ser asta cîhanî û herêmî ye da ku em yek deng bi yek armancê bin.
***ANHA***




# Edhem Omer: "Rakirina destana Derwêşê Evdê ji materyalên perwerdeyê xizmeta dijmin dike"

Endamê Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hûner ya bajarê Qamişlo Edhem Omer diyar kir ku rakirina destana Derwêşê Evdê ji materyalên perwerdeyê yên başûrê Kurdistanê, li ser daxwaziya dijmin e da dîrok û çanda Kurdan bihelînin û got, 'eger îro destana Derwêşê Evdê rakirin wê sibê zimanê kurdî jî qedexe bikin.'

**Jiyan Ebas-Qamişlo**



Wezareta Perwerde û Fêrkirinê ya Hikumeta başûrê Kurdistanê 12`ê Kanûnê ragihand ku bi egera "Bêrêziya li hemberî ola islamê" destdana Derwêşê Evdê ji materyalên perwerdeyê yên sala bê rakirine.
Yekgirtûya Îslamî di parlementoyê de derbarê gotina Derwêş ya "Ez ji ola islamê dûr im" ji hikumeta başûrê Kurdistanê daxwazî kir ku lêborînê ji misilmanan bixwaze.
Destana Derwêşê Evdê destaneke kurdî ye. Tê de qehremanî û rûmetê destnîşan dike. Destan ji nifşekî derbasî nifşekî din bûye û gelê Kurdan di her civata xwe de gotiye. Êdî mirov dikare bibêje ku destan nîşana xeta berxwedanê ye ku gelê Kurd di pêvajoya dîrokê de daye meşandin.
Têkilarî mijarê endamê Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya bajarê Qamişlo Edhem Omer ev nirxandin kir: "Armanc ji rakirina destana Derwêşê Evdê ji materyalên perwerdeyê yên başûrê Kurdistanê, pêkanîna daxwaziya dijmin e. Lewra Derwêş şervanekî Kurd bû û li dijî dijminan şer dikir."
Edhem Omer da zanîn ku Derwêşê Evdê bi piştgiriya xayînan bi destê dijmin hat kuştin û bi navê heskirinê li dijî wî kompoloyek hat plankirin. Armanc tinekirina lehengên Kurd bû.
Edhem da xuyakirin ku li ser lehengiya kurdan gelek serpêhatî û çîrok hene, ku ji nifşekî derbasî nifşê din bûne û axaftina xwe wiha domand: "Lê yek ji van çîrokan di materyalên perwerdeyê yên başûrê Kurdistanê de nîne. Ev jî li ser daxwaziya dijmin pêk tê ku hewl dide dîroka Kurdan ji holê rake."
Edhem Omer bal kişand ser helwesta hikumeta başûrê Kurdistanê û wihagot: "Hikumeta başûrê Kurdistanê xwestekên dewleta tirkî pêk tîne. Lewra eger niha destana Derwêşê Evdê ji materyalên perwerdeyê were rakirin wê sibê xwendina bi zimanê kurdî jî were qedexekirin."
Omer herwiha got, divê Kurd parastina dîroka xwe bikin û li gorî şert û mercên doza xwe tev bigerin. Her wiha parastina destkeftiyên bi saya şehîdan hatîn bidestxitin, bikin.
Endamê Navenda Çand û huner Edhem Omer wiha got: "Destana Derwêşê Evdê, qehremanî û berxwedana li Şingalê hatî kirin, di dîrokê de hatine nivîsandin. Lê dijmin dixwaze vê dîrokê bi destê Osmanî, faşîst û xayînan ji holê rake."
Edhem Omer da zanîn ku dijmin dixwaze wê berxwedana bêhempa ya Kurdan di pêvajoya dîrokê de raber kirî ji meteryalan rake da heta hetayê were jibîrkirin.
Têkildarî helwesta PDK`ê Edhem ev nirxandin kir: "Xayînên ku destekê didin dijmin, xizmeta berjewendiyên



dijminê gelê Kurd dikin. Lewra destaneke wiha dîrokî ku balê dikişîne ser berxwedana Kurdan ji materyalên perwerdeyê radike. Armanc ji vê yekê jî ew e ku di bîr û bala zarokên me û nifşên bê de nemîne."
Edhem got, berûvajî xayînên bi hevkariya dijminan dîrokê dihelînin, bi hezaran yên wekî Derwêşê Evdê hene û parastina xak û dîroka xwe dikin.
Wezareta Perwerde û Fêrkirinê ya Hikumeta başûrê Kurdistanê destana Derwêşê Evdê sala 2007-2008`an li materyalên pewerdeyê zêde kiribû.

# Li dijî asîmîlasyonê divê ji bo Kurdî karekî mezin bê kirin

**Nivîskarê Kurd Nezîr Ocek got, li dijî asîmîlasyonê divê ziman û wêjeya kurdî bê xurtkirin.**

Nivîskar Nezîr Ocek ku bi karên xwe yên li ser Kurdî tê naskirin, wiha axivî "Gelê Kurd divê xwedî li zimanê xwe derkeve; li malê, li kolanan, li her derê divê bi Kurdî biaxivin."
Ocek ku li ser ziman û wêjeya Kurd dixebite; li gel pirtûkên xwe yên bi navê Waneyên Rêzimana Kurmancî, Wêjeya Kurdî, Dîn û Mîtolojî û Destana Rustemê Zal her wiha gelek wergerên wêjeya Kurdî kiriye, piştgirî da hewldanên saziyî yên mîna Kurdî Derê yên ji bo Kurdî.
Ocek got, "Heta ku sax bim ez ê ji bo Kurdî karê xwe dewam bikim" û got, "Di dema şaredariyên me de ji bo Kurdî gelek tişt hatin kirin. Her wiha li saziyên me perwerdeya bi Kurdî dihate dayin, ji bo paşeroja zimanê Kurdî kar dihate kirin. Piştre dewletê dest danî ser saxiyên Kurdan, qeyûm li şaredariyan danîn. Li şûna saziyên me saziyên xwe ava kir; dest bi bikaranîna ol kir. Bi taybetî û ji bo asîmîlekirina zarokên Kurdan hewl dide."
Ocek diyar kir ku Ereb, Tirk û Fars hewl didin ziman û çanda Kurd asîmîle bikin û destnîşan kir ku li dijî vê asîmîlasyonê divê rewşenbîr, nivîskar û hunermendên Kurd ji bo pêşvebirina wêje û zimanê Kurdî hîn bêhtir bixebitin, kedê bidin.
Ocek got, "Gelê Kurd divê xwedî li zimanê xwe derkeve; li malê, li kolanan, li her derê divê bi Kurdî biaxivin. Zarokên me ku paşeroja ziman û çanda me ne, hêdî hêdî di nava çand û zimanekî cuda de mezin dibin. Divê em zarokên xwe bi çîrokên bi zimanê xwe mezin bikin. Divê em



xwedî li zarokên xwe derkevin. Divê her Kurd mala xwe bike dibistanek; bi Kurdî biaxivin û bi çanda Kurd bijîn."
***ANF***

# Li Tebqa û Minbicê şano hatin pêşandan

**Li Tebqa şanoya "Çinîna dojehî" û li Minbicê şanoya "Rakirina stiriyan" hatin pêşandan.**

Li Navenda Çand û Hunerê ya Tebqayê bi amadebûna bi dehan şêniyên bajêr, saziyên sivîl, leşkerî, siyasî û jinan şanoya "Çinîna dojehê" hate pêşandan.
Şanoya "Çinîna dojehê "ya ji derhêneriya Amir Înad di Mihîcana Şehîd Arîn a Keziyên Aştiyê ya Kobanê de hate pêşandan. Bêrîvan Dodax, Amir û Fadî Ebdullah di şanoyê de lîstin.
Şano îşaretê bi rewşa Sûriyê û şerê lê dike, nexasim sûcên ji aliyê komên çeteyan ên piştgiriya xwe ji dewleta Tirk werdigirin.
Wateya rastîn a vê şanoyê berhevkirina kiryarên xirab û şerê reş ê ku Sûriyê tê re derbas bûye. Armanc ji vê şanoyê ew e ku peyamekê ji cîhanê re û hezkiriyên aştî û îstiqrara welat, nexasim Sûriyê ye. Di dawiyê de şano ji aliyê beşdaran ve hate nirxandin.

**MINBIC**

Koma Çand û Hunerê ya Minbicê şanoya "Rakirina stiriyan" pêşanda. Şano balê dikişîne ser heqaret û nefreta di nav welatiyan de.
Şano li ser dika şano ya Çand û Hunerê ya rojavayê bajarê Minbicê bi amadebûna endamên saziyên sivîl û şêniyan hate pêşdan.
beriya şano were pêşandan, Hevseroka Komîteya Çand û Hunerê Roz Îshaq bixêrhatina beşdaran kir û spasiya her kesên beşdarî amadekirina vê şanoyê bûne, kir.
Şano îşaret bi rakirina heqaret û nefretkirina navbera gel kir, her wiha banga xurtkirina çand lêborandin û hezkirinê kir.
Derhênerên şanoyê Ehmed Şihadê û Şaban Îdo ne.
***ANHA***






## ÇANDA SIYASÎ.. PÊWISTÎ ÇI YE?

GULAL KASANÎ


Nivîskar û rojnemevanê Amerîkî Donald j. Devine dibêje, "Çanda siyasî ne peykerkirina çanda civakê ye, aliyê siyasî ji civakê ye".
Wekî ku tê zanîn, zarava çanda siyasî zaravayeke nûjen e, ta rêjeyekê; ji ber ku di nîvê çerxa bîstan de, cihê xwe di zanyariya civakî de girtiye.
Erê rast e, zanyarê felsefeyê Georg Wilhelm Friedrich Hegel wiha dibêje: "Siyaset di 3`ê qonxan re derbas dibe; ji Malbatê (Hoz yan Êl) ta ku digihîje civaka sivîl û ta digigîje xwehremendiyê (Dewlet), lê, Hegel bi taybetî li ser çanda siyasî, ti xwendin nenivîsandine yan jî vekolîn nekirine; tenê dibêje, civaka rojhilatî mêldara zordestiyê ye.
Eger em li gorî pîvanên diyalektîkî ya Hegel ya li ser bingehê ku dibêje, "Hizir û raman her tiştî kontrol dikin, tê wê wateyê ku pêwîst e, ti gel di binê nîrê zordestiyê de namînin. Dêmekî xuya dike ka çanda siyasî çi ye?
Gelo raman û hizir in, bîrdozî ye yan jî tenê kelepor e.
Têgeha siyasî bûye ji wan pêwîstiyên herî girîng, di zaniyariya civakî de, ew e yek ji wan hêmanên herî bingehîn bo jihevwejrandina rewşa civakê; di çarçoveya xwe ya di bin bandora nîr û kewdanên aborî, siyasî û civakî de ye.
Ew rewşa ne saxlem e, çi ji aliyê siasî ve be û çi jî ji aliyê aborî ve be, bandoreke yekser li çanda siyasî jî dike, dibe sedem ku çanda siyasî, ne aram bimîne, rewşeke lihevketî çêbe. Ji encama tevliheviyekê dikeve navbera rast û nerastiyê. Mirov nema êdî tehliyê û şîrîniyê ji hev cuda bike. Dêmek pêwîst e ku tevgera siyasî di aliyê naskirina têgeh û karedarên çanda siyasî de û bi çi awayî ava dibe û di dawî de, civakê zana bike; dê jixwe ve gel tevlî rewşa siyasî bibe û xwe bibîne berpirsiyar bo pêşxistina civakê û avakirina jiyaneke jîndar û hevbeş.
Rewêla siyasî cureyeke ji şêwazên civakî ye. Lê desthilat, hikûmat, partî û saziyên sivîl her yek ji aliyê xwe ve raman û hizrên çanda siyasî li civakê belav dike. Desthilat ji aliyê xwe ve çanda desthiladariya xwe belav dike û dixwaze civakê bigihîne wê baweriyê ku ew e ya ji bo civakê dike. Çi ji aliyê pêkanîna mafan ji aliyê parastina sînorê welat û çi ji aliyê pêşkêşkirina xizmetgûzariyan..TD
Partiyên siyasî jî ji aliyê xwe ve çanda partîtiya xwe li gorî îdeolojiya li ser pêkan e, di nava gel de belav dike. Herwisa civaka sivîl jî …TD
Li gorî van pîvanan wê rewşa çanda kurdî çi be? Hêmanên herî serke ev in: Bîr û baweriya Kurdan ji bo neteweya xwe; kêşeya kurdî bûye pirsgirêka van her çar welatên hawîrdor, mafê çarenûsê ji mafê gelê Kurd e, çareya kêşeya kurdî girêdayî bi rewşa demokrasiya van welatan e. Pêkvejiyan pêwîst e bi pêkhateyên wan welatan ve, lê li vir pirs tê kirin gelo pirbûna partiyan wê çi çanda siyasî biafirîne?
Pirbûna yekîtiyên nivîskaran, wê çi çanda siyasî di nava gel de belav bike. Dema ku endamên wan yekîtiyan bi qeyd û bendên rêwala partîtiyê ve, dîl bin?

# Kargeha tekstîlê ya li Hesekê pîşesaziya herêmê geş dike

Kargeha tekstîlê ya li Hesekê hewl dide bi peydakirina madeyên xav pîşesaziya herêmî pêş bixe.







Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 5`ê Kanûnê kargeha tekstîl a li Hesekê ji nû ve vekir. Rêveberiya Xweser bi vê gavê hewl dide dorpêça li ser herêmê bişikîne û rêgeza xwetêrkirinê peyda bike.

Kargeh piştî destpêkirina aloziya Sûriyê sala 2011`an, sala 2012`an rawestiyabû.

Desteya Aborî ya Rêveberiya Xweser bi rêjeya ji sedî 80 alav û amûrên kargehê ji nû ve sererast kirin, kehrebe gihand wê, karker û kesên pispor jê re peyda kirin.

Li gorî berpirsê beşa fenî ya kargehê Fehid Celo, di kargehê de 74 alavên veçirandina pembo û derziyên wê, her wiha alavên dirûtina cilan û debaxkirinê hene.

Piştî ku Rêveberiya Xweser hezar û 500 ton pemboya veçirandî peyda kir, kargeh 24 saetan dixebite û rojane 6 ton ta tê hilberandin. Ji bo kargeh raneweste, pêwîstiya wê di salê de bi 2 hezar û 500 ton heta 3 hezar ton pemboya heye.

Ev pêwîstî, dê cotkaran teşwîq bike ku careke din pembo biçînin, da ku pêdiviyên kargehê yên madeyên xav peyda bikin. Her wiha ev yek dê gelek derfetên kar di warê çandiniyê de peyda bike.

Li gorî çavdêrên aborî, li gel dorpêça li ser herêmê ev kargeh dê roleke girîng û mezin di aboriya herêmê de bilîze. Ji ber ku dê madeyên xav ên kargehên herêmî peyda bike, dê pêdiviyên herêma pîşeyî yên madeyên bingehîn û gelek derfetên kar peyda bike.

Di destpêka kar de 135 derfetên kar çêbûn û berpirsên kargehê plan dikin ku di pêvajoya bê de ji bo zêdekirina hilberînê, 520 derfetên kar peyda bikin.

Gerînendeyê têkiliyan a kargehê Îbrahîm Hisên destnîşan kir ku kargeh dê roleke erênî di aboriya herêmê de bilîze.

Li gorî Fehid Celo di kargehê de beşek ji bo çêkirina caw û cilên jî heye, lê hîna nehatine xebitandin. Heke werin xebitandin dê cilên pembo yên xwedî kalîteya baş hilberîne.

***ANHA***

# Komîteya Tenduristiyê ya Dêrazorê banga xweparastinê ji vîrûsa korona kir

**Hevserokê Komîteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Sivîl ya Dêrazorê Mihemed El-Salim diyar kir ku guhnedana tedbîrên pêşîlêgirtinê, bû sedema zêdebûna jimara nexweşên vîrûsê. Herwiha bang li welatiyan kir ku tedbîrên parastinê bigirin.**

Hevserokê Komîteya Tenduristiyê Rêveberiya Sivîl a Dêrazorê Mihemed El-Salim diyar kir ku di pêla yekemîn a vîrusa Koronayê de li gundewarên Dêrazorê nexweşên koronayê tune bûn, lê di pêla duyemîn, sêyemîn û çaremîn de zêdebûneke berçav di hejmara pêketiyên vîrusê de hene, sedema sereke jî negirtina tedbîrên pêşîlêgirtinê ye.

El-Salim got, hejmara kesên ku bi koronayê ketine gihaşt 3 hezar û 551 kes in û ji wan 61 kesan jiyana xwe ji dest dane.

El-Salim bi domdarî got: "Piraniya nexweşên koronayê li herêma Xeranîcê ya gundewarê rojhilatê Dêrazorê ne, ji ber ku ew li kêleka çem e û nêzî herêmên hikumeta Şamê ye. Lê niha em dibînin ku li gundewarê rojavayê Dêrazorê, li herêmên Hermûşiyê, Kuber û Ebû Xeşeb jî hejmara nexweşên korona zêde dibin."

El-Salim wiha lê zêde kir: "Li herêma Kuber hejmara nexweşên korona zêde bidin û ji ber ku klînîka berê ne di xizmetê de ye, klînîkek tendirustiyê tune ye. Me xebatên xwe yên ji bo erêkirinê û diyarkirina bûdceyekê ji Rêveberiya Xweser ji bo avakirina klînîkeke tenduristiyê li herêmê, kiriye û di rojên pêş de xebatên avakirina wê dest pê dikin."

**KÊMBÛNA ALAVÊN TENDURISTIYÊ**

El-Salim diyar kirk u wan li Kuber û Hermûşiyê derman û tupên oksîjenê ji nexweşên bi vîrûsa Koronayê re peyda kirine û destnîşan kir ku kêmbûneke mezin di tupên oksîjenê de heye



û hejmara ku di destên wan de ne, têra tevahî herêmê nake, ji ber ku pêwîstiya her nexweşekî bi zêdetirî 5 tupên oksîjenê heye.

El-Salim di dawiya axaftina xwe de bang li hemû şêniyên Dêrezorê û gundewarê wê kir ku tedbîrên pêwîst ji bo pêşîgirtina li belavbûna vîrusê bigirin.

***ANHA***

# Yekîtiya Bijîşkan konferansek li dar xist

**Yekîtiya Bijîşkan ya Herêma Cizîrê şaxê Hesekê bi armanca amadekariyên kongreya xwe ya 2yan, konferansek li dar xist.**

Yekîtiya Bijîşkan ya Herêma Cizîrê şaxê Hesekê konferansa xwe ya 4an li dar xist da ku kar û barên yekitiyê nîqaş bikin û hevserok û endamên Hesekê hilbijarin, her wiha amadekariya lidarxistina kongreya 2`yan bikin.

Konferans li hola Tevgera Civaka Demokratîk a li taxa Til Hecer hate lidarxistin. Bi dehan bijîşk, hevserokê Yekitiya Bijîşkan a Herêma Cizîrê Dr. Ehmed Yusif, gerînendeyê darayî yê Yekitiya Bijîşkan û Dermanxaneyan a Bakur û



Rojhilatê Sûriyê Rojhat Laser, hevserokê Yekitiya Bijîşkan Şaxê Hesekê Ebdulbasit Xenafir û hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk a Herêma Hesekê Ferhan Dawûd tev li konferansê bûn.

Gerînendeyê Yekitiya Bijîşkan û Dermanxaneyan Rojhat Laser lidarxistina konferansê pîroz kir. Laser bang li tevahiya bijîşkan kir ku ji bo xizmeta gelê xwe hemû astengiyan derbas bikin, bi erka xwe rabin.



Dûre beşdaran dest bi nîqaşan kir û tê de îşaret bi projeyên nû kirin, ji wan li Hesekê klînîkên tibî werin vekirin û yekkirina heqdestên doktoran çêbe.

Konferansa 4`an bi hilbijartina hevserokên Yekitiya Bijîşkan a şaxê Hesekê bi dawî bû ku Dr. Şehnaz Sebrî û Dr. Şêrzad Emîn hatin hilbijartin.

Piştî konferansê Dr. Yusif Ehmed ji ajansa me re axivî û got armanca lidarxistina vê konferansê, amadekariya






kongreya 2`yemîn a yekitiyê ye ku tê payîn 2022`yan li dar bikeve.

Li gorî hevserokê yekitiyê, hejmara endamên Yekitiya Bijîşkan a Herêma Cizîrê 680 e.

***ANHA***



## SÊMALKA..... ERDOGAN FERMAN DA, BARZANÎ GIRT

Dilyar Cizîrî

Malbatên şehîdan ev nêzî 3 mean e li deriyê Sêmalka ji bo wergirtina cenazeyên 2 gêrîlayên ji Rojava yên li Xelîfana Başûrê Kurdistanê di kemîna hêzên PDK'ê de hatin şehîdkirin, çalakî lidar xistine. Ev nêzî sê mehan e rayedarên PDK'ê bersiva çalakvanan nade û çalakvanan ji ne dîtî ve hesab dike.

Ji ber daxwazên mafdar ên malbatan, çalakiya wan di raya giştî ya Kurdistanê de bandor kir. Rayedarên PDK'ê ji vê yekê tengav bûn, ji lewra bi hinceta çalakiya ciwanên şoreşger bêyî tu agahiyan bidin, deriyê Sêmalka ji aliyê xwe ve di riwê bi sedan nexweşên Rojava û kesên xwedî pêwîst girtin. Di vir tenê de sînordar nema, deriyê El-Welîd ku 35 kîlometreyan dûrî Sêmalkiya û ji bo bazirganiyê dihate bikaranîn jî girtin.

Bi vê jî riyên mirovî û bazirganiyê li ser parçeyê biçûk ê Kurdistanê girtin. Wer xuyaye Rayedarên PDK'ê jibîr kirin salên 1991'an çawa xelkên Rojava (herêma niha xistine çemberê) di şert û mercên herî zehmet ên desthiladariya Baas de, alîkarî berhev dikirin û dişandin Başûr, di heman demê de bi sedan malbat pêşwazî kirin.

Girtina dergehên Fîşxabûr û Elwelîd ne tesadife û ne ji ber çalakiya ciwanên Şoreşger e. Heger em rewşa herêmê hinekî analîz bikin, wê ev baş diyar bibe, ev demeke hikûmeta Şamê riyên di navbera xwe û herêmên Rêveberiya Xwerser asê kirine.

Li aliyê din jî tekoşîna QSD'ê ya li dijî şaneyên razayî yên DAIŞ'ê wekî şerê li dijî sivîlan nîşan dide. Her wiha êrîşên DAIŞ'ê digre ser xwe, di ragîhandinên xwe de dike ku ew êrîş bi destê "Berxwedana Gel" pêk hatiye. Teqîna motorsklêtê li Hesekê herî dawî û bûyerên li Dêrazorê vê rastiyê nîşan dide.

Di heman demê de dewleta Tirk ku vê carê nikarînnû OK'ê ji bo êrîşeke nû ji Amerîkka û Rûsiya bi dest bixe, berê sînorê xwe yê dirêj li dijî Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikar tîne. Yenî girtina sînor ji aliyê PDK'ê ve ne tiştekî ji rêzê ye, lê belê beşek ji plana dewleta Tirk û hikûmeta Şamê ya dijberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye.

Hikûmeta Erdogan û Hikûmeta Şamê ev demek dirêj e, nikarin planên xwe li dijî herêmê pêk bîn in, ji lewma niha PDK'ê beşê mezin ji vê erkê girtiye. Tişta van rastiyan isbat dike jî, mijar ne tenê girtina deriye.

Mane dewleta Tirk li Efrînê bi sedhezaran kurdên resen dane koçberkirin û li şûna wan 400 hezar malbatên çeteyên xwe li wir bi cih kirine. Mane rojane agahiyên revandin, kuştin, talan, wêranî û qutkirina zeytûnan ji Efrînê tên؟. Di demeke wiha de Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî pêwîstiya nûnerên "Meclîsa Xwecihî ya Efrînê" ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye avakkirin, dike. PDK'ê bi vê hevdîtinê dixwaze meclîsa dagirkeran bide naskirin û hewl dide dagirkeriya Efrînê rewa bike. Ji xwe ev serdan yekser bi fermana dewleta Tirk pêk hatiye.

Girtina SÊMALKA di çarçoveya heman pîlana dewleta Tirk de pêk hatiye. Ew konsebta hevbeş a hikûmeta Şamê û dewleta Tirk a li dijî gelê Rojavayê Kurdistanê ye. Bûyera li Dirbêsiyê ya şewata buroya ENKS'ê û teqîna li Hesekê û êrîşên li ser Zirgan, Til Temir û Ên Îsa yê ji xalên din ên heman pîlanên ne.

Dixwazin bi van kirinên xwe xelkên herêmê bînin dijî Rêveberiya Xwerser û di hindir de pirsgirêkan derxin. Lê bela baş bizanin, gelê Rojava fêr bûye, xwe li gorî hemû şert û mercan dîzayîn kiriye. Wê bi hêsanî berxwedana xwe bidomîne û pîlanên hevbeş ên Erdogan, Barzanî û Beşar El-Esed bêbandor bike.



# QSD: Çapemeniya hikumeta Şamê nûçeyên derew belav dike

QSD`ê ragihand ku idîyayên dezgehên çapemeniyê yên girêdayî hikumeta Şamê yên derbarê qaşo operasyonên QSD`ê li dijî sivîlan li gundewarê bakurê Dêrazorê derew in.




Têkildarî mijarê, Navenda Ragihandinê ya QSD`ê daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Ajansa SANA ya girêdayî hikumeta Şamê derbarê operasyonên hêzên me li dijî DAIŞ`ê agahiyên derew belav kir. Di nûçeyeke ajansê de hate gotin ku hêzên me bi destekdayîna helîkoptirên Koalisyona Navneteweyî girt ser gelek malên li bajarê Ebû El-Nîtil ê gundewarên bakurê Dêrzorê û hejmarek ji şêniyên bajarok, girt. Em piştrast dikin ku ev nûçe derew e. Hêzên me tu operasyon li herêma navborî di nava rojên borî de pêk neanîne. Her wiha ajansê îdiya kir ku 3 şervanên me di êrişa ku komên çete yên terorîst li ser rêya Heqil Umer ê petrolê yê li rojhilatê Dêrazorê pêk anî, şehîd bûne. Em piştrast dikin ku ev nûçe jî derew e û tu şervanên me li wê herêmê rastî tu êrişan nehatine. Berpirsên ajansa SANA bi belavkirina nûçeyan li ser operasyonên terorîst ên li dijî herêmê û propogandeya wê, hewl didin tolê ji şêniyên herêmê yên ku bi tundî "Lihevkirina" bi desthildariya Şamê re li herêma Dêrazorê ya rizgarkirî red kirin, rabikin. Her wiha SANA girtina endamên şaneyên DAIŞ`ê ji aliyê hêzên me ve, wekî sivîl nîşan didin û bi vê yekê jî hewl didin ku bi rêbazên xerab raya giştî bixapînin û xwe ranegirtina wan li hemberî serkeftinên hêzên me di parastina xelkê û gel ji xeteriya DAIŞ`ê û şaneyên wekî wan, derdikeve holê.

Piştî çend rojan ajansa "SANA" dê dehsaliya "nûçeyên derew" ên ku di salên borî de li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku ji terora DAIŞê hatine rizgarkirin belav dikirin, bi dawî bike.

Diyar e rêveberiya ajansê û edîtoriya wê, fermanên şaş di belavkirina nûçeyên derew de digire, da ku şaneyên terorîst ku dixwazin aramî û ewlehiya herêmê xira bikin, berê wan bidin herêmê."

***ANHA***

# Bi sedan şêniyên Tirbespiyê şehîd Şervan Şedadê veşartin

**Bi sedan şêniyên navçeya Tirbespiyê cenazeyê şervanê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Şervan Şedadê bi merasimekê spartin axê.**

Bi sedan şêniyên navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişlo beşdarî merasîma cenazeyê şervanê YPG`ê Avram Somî (Şervan Şedadê) ku di 9'ê Kanûnê de li Hesekê dema ku erka xwe pêk dianî şehîd bû, bûn û ber bi goristana Suryanan a li bakurê navçeyê ve ketin rê.



Di merasîmê de li ser navê Meclisa Malbatên Şehîdan a navçeyê Ebdî Xelef bal kişand ser fedekariya mezin a şervanên YPG'ê û YPJ'ê ji bo parastina destkeftiyên gel.

Piştre fermandarekî Hêzên Parastina Gel Heqî Bahoz diyar kir ku dilsoziya bi xwîna şehîdan di kesayeta şehîd Şervan de ye, ku çeka birayê xwe yê şehîd hilgirt da herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê biparêze.

Bavê şehîd Qasim Somî jî soza şopandina rêya şehîdan heta têkbirina hemû kompoyên ku hewl didin vîna gelên herêmê têk bibin, da.

Di dawiya merasîmê de, wesîqeya şehadetê hate xwendin û radestî malbatên şehîd hate kirin.

***ANHA***

# Piştî deriyê Pêşxabûr, PDK`ê deriyê El-Welîd jî girt




**PDK`ê roja Yekşemê serê sibê deriyê El-Welîd yê girêdayî başûrê Kurdistanê û li hemberî deriyê Siwêdiyê yê herêma Koçeran ya girêdayî Dêrikê, girt**

Rêveberên deriyê Sêmalka eşkere kir ku berpirsên PDK`ê biryar dan ku deriyê El-Welîd ê bazirganiyê yê di navbera Rojava û Başûrê Kurdistanê de were girtin û derfetê nedin tu madeyan ku bi rêya derî derbasî Rojava bibe.

Nûçegihanê me bi dîmen û wêne girtina deriyê El-Welîd ê li beramberî gundê Siwêdiyê yê girêdayî herêma Koçerat a navçeya Dêrikê, belge kir.

Deriyê El-Welîd 35 km dûrî deriyê sînor ê Sêmalkayê ye û rêveberiya deriyê Pêşxabûr ê girêdayî PDK`ê rêveberiya deriyê El-Welîd dike.

Deriyê El-Welîd beriya 4 salan hate vekirinda ku madeyên lêkirinê weke çemento û hesin derbas bibe.

PDK`ê roja pênşema borî jî deriyê Pêşxabûr girtibû.

Tê payîn ku îro rêveberiya deriyê Sêmalkayê di saet 13:00`an de daxuyaniyekê di vê çarçoveyê de bide.

***ANHA***

# Li Kobanê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan konê çalakiyê



**Bi armanca rakirina tecrîda li ser Rêber Ocalan û xwesteka pêkanîna azadiya wî ya fîzîkî, li Qada Şehîd Egîd ya li navenda bajêr ya Kobanê konê çalakiyê hat vegirtin.**

Qada Şehîd Egîd ku lê konê çalakiyê hatiye vegirtin, bi wêneyên rêber Ocalan hate xemilandin. Di roja yekê de şêniyên navçeyên Şêran û Çelebiyê yên kantona Kobanê serdana kon kir.

Di çalakiyê de endama rêveber a Kongra Star a herêma Firatê Macîde Hesûn axivî û wiha got: "Roj bi roj tecrîda li dijî rêber Ocalan zêde dibe. dijmin baş dizanin ku fikirê rêbertî kilîta çareseriyê ya krîzên Rojhilata Navîn e, ji lew re hewl didin fikirê wî yê azad dorpêç bikin."

Macîde Hesûn wiha domand: "Dem dema şikandina tecrîda li ser rêberê me û azadkirina wî ye.

Piştre Yekitiya Jinên Ciwan a herêma Firatê daxuyaniyek da. Endama yekitiyê Heyfa Ehmed daxuyanî xwend, tê de tecrîda li dijî rêber Ocalan şermezar kir.

Di daxuyaniyê de bêdengiya dewletan têkildarî tecrîda ku dewleta Tirk a dagirker li ser rêber Ocalan ferz kiriye, hate şermezarkirin û bang li aliyên peywendîdar hate kirin ku bi erka xwe rabin.

Di daxuyaniyê e hate destnîşankirin ku PDK'ê di komploya dewleta Tirk a dagirker a li dijî gelê Kurd de tevkar e û êdî di vê dawiyê de planên dewleta Tirk bi awayekî eşkere pêk tîne.

Di dawiyê de bang li gelên herêmê hate kirin ku ji bo şikandina tecrîda li ser rêber Ocalan ku armanca wê ya yekemîn şikandina vîna gelên herêmê ye, biherikin qadan.

Dê çalakiya kon heta 21'ê vê mehê berdewam bike. Ji saet 10'ê sibehê heya saet 3 berêvarê dest bi çalakiyan dibe. Dê meclisên navçe û şaredariyên girêdayî kantona Kobanê tev li çalakiyê bibin û li gorî agahiyan dê sibe navçeyên Qenayê û Sirînê beşdar bibin.

***ANHA***

# Rejima Îranê siyasetmedarekî Kurd darve kir

**RejIma Îranê li girtîgeha bajarê Sine ya tojhilatê Kurdistanê siyasetmedarê Kurd Heyder Qurbanî darve kir.**

Li gorî Rêxistina Mafên Mirovan Hengaw, Heyder Qurbanî ku ji sala 2016'an û vir ve girtî bû, 19'ê Kanûnê saet di 09:00 de li girtîgeha Sine hat darvekirin.

Qurbanî bi "Endamtiya Partiya



Demokrat ya Kurdistana Îranê (PDK-Î)" û "mûxalefeta" li dewleta Îranê dihat sûcdarkirin.

***ANHA***

# Li Ekvadorê ji bo derxistina PKK`ê ji 'lîsteya terorê' imze hatin komkirin

**Li Başûrê Amerîka li paytexta Ekvador Quitto, ji bo derxistina PKK`ê ji lîsteya 'rêxistinên terorîst' imze hatin komkirin.**

Insîyatîva Adaleta Navnetewî ya ji bo Kurdan ji bo ku PKK ji nav lîsteyê were derxistin li paytexta Ekvadorê Quîttoyê standayên îmzeyê danîn.

Standek jê ji bo fuara pirtûan ya li Qesra Carondeletê hate danîn, ya din jî li kolana Reîne Vîctorîa hate danîn.



Endamên Kolektîfê ji aliyekî ve îmzeyan kom dikin û ji aliyê dî ve jî behsa neheqiya li ser Kurdan dikin.

***ANHA***

# Fikrê Rêbertiyê ji tevayiya gelên bindest re riya rizgariyê ye

Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku fikirê Rêbertiyê ji tevayiya gelên bindest re riya rizgariyê ye û gotin, emê têkoşîna xwe heta azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan bidomînin.

**Jiyan Ebas-Qamişlo**



Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku Rêber Abdullah Ocalan ji her pirsgirêka li herêmê re çareseriyeke guncaw pêşniyar kiriye û çareseriya herî girîng di parêznameya xwe ya pêncan de pêşkêş kiriye. Ku ew jî fikra biratiya gelan û neteweya demokratîk e. Rêber Ocalan li ser vê wiha dibêje: "Têkoşîna hevpar ya tevayiya rêxistinan û tevgerên siyasî, jiyana hevbeş ya di navbera gelê cîhanê de ye û garantiya aştî û ewleyiyê ye. Herwiha riya birûmet e ku dawî li kapîtalîzim, neteweperstî û dîroka zilmê tîne."

Welatî li dijî siyaset û kiyarên dewletên serdest û kapîtalîst, berxwedana xwe li ser bingehê fikirê Ocalan didomînin.

### "JI TEVAYIYA GELAN RE DIBISTANEKE FIKIRÎ YE"

Têkildarî mijarê welatiyê bi navê Şoreş Îbrahîm wiha axivî: "Rêber Abdullah Ocalan ji bo tevaiya gel beşên civakê dibistaneke fikirî ye û axaftina xwe wiha domand: "Fikirê Rêbertiyê ji tevayiya gelên bindest re riya rizgariyê ya ber bi jiyaneke azad û demokratîk ve ye. Rêbertî fikirê jiyana hevbeş û neteweya demokratîk di nava gelan de bi cih kir da gel li ser vî bingehî xwe û dîroka xwe ji siyasetên dewletên kapîtalîst biparêzin."

Şoreş bal kişand ser tecîrda giran ya faşîzma dewleta tirkî ku 23 sal in li ser Rêber Abdullah Ocalan dimeşe û wiha got: "Dewletên hegemon hewl didin fikirê demokratîk sînordar bikin. Ji ber wê tecrîdeke giran li ser Rêber Ocalan dimeşînin. Lê digel siyset û kiryarên faşîzma tirkî, ev fikir gihîşt seranserê cîhanê."

Şoreş Îbrahîm got, divê civaka navneteweyî berpirsiyariyên xwe pêk bîne û tecrîda li ser Rêber Ocalan rake û axaftina xwe wiha domand: "Em ji têkoşîna xwe venagerin û emê piştgiriya fikir û felsefeya Rêber Ocalan bikin û banga azadiya wî ya fîzîkî dikin."

### "GEL LI DIJÎ SIYASETÊN DEWLETÊN KOMPLOGER HEVGIRTÎ NE"

Şoreş Îbrahîm got, Rêber Ocalan rêberekî neteweyî ye û ji bo mirovayiyê û tevayiya civakan têdikoşe. Herwiha aştî û fikirê demokratîk li Rojhilata Navî belav dike da pirsgirêkên heyîn werin çareserkirin.

Şoreş Îbrahîm bal kişand ser gel û civakên fikir û felsefeya Rêber Ocalan qebûl dikin û wiha dewam kir: "Tevayiya gelan li ser bingehê fikirê Ocalan têdikoşin. Lewra fikrekî neteweyî ye û li dijî paşverûtiyê yê hêzên desthilat ya bi sedê salan e.

Şoreş herwiha bang li gelê Rojhilata Navî kir ku li dijî siyaseta dewletên komploger hevgirtina xwe ava bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Dewletên komploger bi tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan hewl didin azadiya civakan têk bibin."



### "EMÊ TÊKOŞÎNÊ LI SER BINGEHÊ FIKIRÊ RÊBERTIYÊ BIDOMÎNIN"

Welatiya bi navê Delal Bedûr jî tecrîda li ser Rêber Ocalan şermezar kir û wiha pê de çû: "Emê li ser bingehê fikir û felsefeya Rêbertiyê têkoşîna xwe bidomînin û hêzên komploger çiqas tecrîdê giran bikin jî wê nikaribin moral û vîna Kurdan bişkînin."

Di dawiyê de Delal Bedûr banga xwedîderketina li fikir û felsefeya Rêber Ocalan û xurtkirina têkoşînê li tevayiya civakê kir, da azadiya fîzîkî ya Rêbertiyê misoger bikin.

# Gelên herêmê wê li hemberî dagîrkeran serî daneynin

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

**Ebdulhadî Ehmed: "Dewleta tirkî ya dagîrker bi gef û êrişên ser gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, dixwaze temenê desthilatdariya xwe dirêj bike."**

Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê û têkbirina projeya Neteweya Demokratîk, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, Erdogan û çeteyên wî gefên xwe li ser herêmê zêde dikin û ji bo qirkirina gelên herêmê bi hêzên serdest re di nava bazarê de ye. Li ser vê mijarê Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Ebdulhadî Ehmed ji me re axivî.



Ehmed diyar kir ku ji destpêka krîza Sûriyê ve, dewleta tirkî ya dagîrker gefên dagîrkirinê li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dixwe û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî ya dagîrker, dixwaze xwe li bakur Sûriyê bi cih bike û siyaseta xwe li ser vî bingehî dide meşandin. Tirkiye, ku wek dewleteke netewperest û faşîst li ser asta Rojhilata Navî tê nasîn, her dem hewl dide vegere 'Mîsaqê Milî' da bikare bakurê Sûriyê û Iraqê bixe destê xwe. Rayedarên Tirk li dû xewn û xeyalên dagîrkirinê bi şev û roj planan saz dikin. Dagîrkerî dixwaze ji krîzên Rojhilata Navî sûdê bigre û dagîrkirina xwe li herêmê fireh bike."

Ehmed da zanîn ku siyaseta dewleta tirkî ya faşîst ji her kesî re eşkere bûye û wiha dewamî da axftina xwe: "Siyasta dewleta tirkî zelal e, Projeya Biratiya Gelan ya demokratîk û aştîxwaz, ya li ser bingehê wekhevî û edaleta civakî ava bûyî qet qebûl nake. Tirkiye eşkere dibêje, hebûna statûyeke demokratîk ji me re xeter. Ji ber wê gef û êrişên dagîrkeriya tirkî li ser herêmê wê di rojevê de bin. Dewletên faşîst her ku lewaz dibin, har û dîntir dibin."

Ehmed bal kişand ser krîzên hundirê Tirkiyê û wiha axivî: "Dagîrkeriya tirkî di krîzeke aborî, siyasî, doplomatîk û civakî re derbas dibe. Ji ber daketina bihayê lîreyê tirkî beramberî dolarê Aemrîkî, dewleta tirkî tengav bûye. Hikûmeta AKPê dixwaze krîzên di hundir de derbasî welatên derdorê bike. Mînakên li ber çav, deswerdana wê di krêzên Sûriy, Iraq, Libya û Yemenê de ye. Herwiha hwl da ku pirsgirêkên di navbera Ermenistan û Azerbeycanê de bixe xizmeta xwe. Derveyî şer ti rêbazên din li cem nemane."

Ehmed da xuyakirin ku dagîrkeriya tirkî di rojeveke zehmet re derbas dibe. Xwest bi Rûsya û Amrîka re peymanan imze bike, lê ti kartên wê yên xurt nemane ku li ser bazaran bike. Ji ber wê hewl dide welatên bi zimanê tirkî diaxivin, li ser bingehê etnîkî kom bike û peyamekê bide cîhanê ku wê xwe li ser bingehê ziman û neteweya tirkî bi rêxistin bikin. Herwiha wê dev ji armancên xwe bernede."

Endamê Meclisa Giştî ya PYDê Ebdulhadî Ehmed ji gelên herêmê xwest ku rêxistina xwe xurt bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Pêwîst e em hêza civakê bikin bingeh û li ser bingehû çanda gelê berxwedêr li ber xwe bidin. Lewra ti ti dewlet wê gel neparêzin. Çavên dewletên faşîst li ser herêmên Rêveberiya Xweser e. Niha amadekariya ji bo berxwedana li hemberî êrişan di asteke bilind de Ye. Peyama me ji bo cîhanê ev e; çawa bakur û rojhilatê Sûriyê bû sembola berxwedanê, ew berxwedan wê dewam bike û êriş têk biçin."



Xweserî û xwelîserî

**Ahmet Aktaş**

Di nava Kurdan de ev her du peyv gelek watedar in. Li xweseriyê pirtir peyva azadî tê bikaranîn. Li hinek herêman xwelîserî jî bi devokî herêmî cuda tê gotin, mînak li Cizîra Botan dibêjin xolîser!

Di vê serdema me ya niha de, mirov dikare wateya van gotinan hîn berfirehtir bike. Ji ber ku êdî kesayetek tê afirandin; li ser birûbawerî, bîrdozî û siyaseta rêberiyên partiyan, dewletan û gelan kes tên perwerdekirin û tevgerkirin.

Kurt cewherî kesayateya niha li Kurdistanê heye, gelo kesayetiyek xweser û azad e an xwesparê hêzen derve û xwelîser e?

Mirov dikare vê mijarê hîn jî dirêj şîrove bike. Lê ka êdî em werin yekser bala xwe bidin kesayetiya nuha li Kurdistanê heye û em bibînin gelo çawa rêberiyê ji gel re dikîn?

Du rêveberiyên sereke û bi vêna ve girêdayî du kesayetiyên sereke hene li Kurdistanê. Yek PDK'a-rêveberiya Hewlêrê ye, ya din jî PKK'a Kurdistanî-gerdûnî ye.

PDK, ji despêka damezrandina xwe ve li ser bawerî û kesayetiyek pişta xwe spartiye dewletan meşiyaye û her vê meşa xwe dewam dike. Sosreta mezintir jî, li gel her çar dewletên dagirker têkiliyên li ser xizmetê ji siyaseta wan re bike daniye; Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriye,

PKK, hema bi kurtayî berovajî PDK'ê, li ser baweriya xweser û azad hatiye damezrandin, baweriya xwe bi xwe û hêza gelê xwe aniye û heta roja îro meşiyaye. Bêgûman li ser vê bîrûbaweriyê kesayetiyek xwedî îradeyek ji pola afirandiye. Lewma karibû li dijî ewqas êrîşên kevneperestiya cîhanî xwe ragire û têkneçe.

PDK, berê wan têkileyên xwelîserî, li gel dewletên dagirker hinekî vaşartî dida meşandin. Lê êdî aşkere, him bi çekdarî li gel wan e him bi gotin weke wan diaxive.

Çapemeniya-TV'yên wan, ji TRT'ya tirka dujmintir, weşana taybetî li dijî Tevgêra Azadiyê dikin.

Li Başûr û Rojava, xizmeta ku ew pêşkêşî dewleta tirka dike, dewleta tirka nikare ewqas xizmetê ji xwe re bike. Bi navên ENKS û Peşmergên R.û hwd, him bi gotin him bi kirin, ketine pêş hêzên dagirkerên tirkan û êrîşî Tevgêra Azadiyê dikin.

Bi giranî nuha êrîşên xwe li ser Rêveberiya Xweser a Rojava dijwartir û zêdetir kirine. Bi tenê deriyê Sêmalka mabû ew jî girtin. Deriyê Babilhewa maye ku ew jî di destê dewleta tirka de ye. Durûtiya navdewletî jî, bi navê alikariyê bi giştî xwedêgiravî ji gelê Suriyeyê re dikin, lê alîkariyê yekser didin dewleta tirka.

Ya ku mirovan gelek dilgiran dike; yek gotinekê li dijî dagirkeriya dewleta tirka ya li Rojava nabêjin, berovajî, guneh hemû dixe stukura Rêveberiya Xweser. Bi vêna jî ranawestin, di TV'yên xwe de her roj koçberên Efrînê vexwendî Efrînê dikin. Her wiha bê şerm nûçeyên "çend kes ji Efrîne hatin revandin û hwd." jî diweşînin!

Yek jî TV'yên wan her roj dibêjin "çend zarok hatine revendin", mîna dayikên ku AKP'ê li Amedê komkirine, nizanim "çendin milet nerihet bûye ji ber kiryar û kêmasiyên Rêveberiya Xweser"! Weke ku ti karê wan ji bilî dujminatiya Rêveberiya xweser nîne. Jixwe AKP'ê ev kar daye ser milê wan!

Mirov vê kesayeta ewqas xwelîser a ketiye erdê dibîne, gelek dilêş dibe. Dîsa hinek kom bi navên Efrînê li Ewrûpayê çêkirine û dikişînin Hewlêrê. Di tv'yên xwe de, xwedêgiravî hatine ji Mesûd Berzanî rica bikin, da ku ji dewleta tirka bixwaze, "bila wan çeteyên wan gelê Efrînê pir ne êşîne" û hwd!

Nizanim gotina XWELÎSER têra wan dike an na?!

Dîsa jî em, wan vexwendî XWESERIYÊ bikin!



# Sîstema işkenceyê ya girtîgehên dewleta tirkî ku bi faşîzmê tên birêvebirin, polîtîkaya qirkirinê ye

Rejima AKP-MHPê rojbiroj polîtîkayên xwe yên qirkirinê bi taybetî li girtîgehan, dijwartir dike. Parlamenterê HDPê got, rejima AKP-MHPê bi ser girtiyan de sîstemeke işkençeya derûnî û fîzîkî disepîne û girtîgeh bûne navendên faşîzm, tolhildana siyasî, kuştin û qirkirinê.

**Serbest Etê/Qamişlo**

Desthilata AKP-MHPê li ser çewisandin û qirkirina gelan, destikdayîna mafya û bikaranîna çeteyan xwe dide avakirin. Vê desthilatê îro Tirkiye di binê dîktatoriya Erdogan de kiriye girtîgeheke mezin. Li gorî amarên fermî li girtîgehên Tirkiyê sala 2002yan berî desthilata AKPê 60 hezar girtî hebûn. Ev jimar 2006an bû 70 hezar. Piştî wê bi salekê jimar bû 90 hezar. Lê gorî şopdaran ji 2016an heta niha êdî jimar bûye bi sedhezaran di navê de bi hezaran jin û bi sedan zarokên wan hene.

### `AKP-MHPê jimara girtiyan 5 qatan zêde kir`

Derbarê mijarê de parêzer û perlmantarê Partiya Gelan ya Demokratîk (HDP) Dogan Erbaş ji me re axivî û li ser sedemên zêdebûna jimara girtiyan wiha got: "Zêdebûna jimara girtiyan û belavbûna girtîgehan li seranserê welat encama polîtîkaya desthilatê ya li dijî hêzên opozisyonê û bi taybetî gelê Kurd e. Desthilata AKP-MHPê jî hebûna xwe bi vê yekê qaşo misoger dike. Jixwe her ku diçe desthilata wê diroxe, lewra her ku diçe hem li derveyî girtîgehan, hem di nava girtîgehan de işkence û derfetên jiyanî dijwartir dikin."



### `Bi sedhezaran li malên xwe cezakirî ne`

Erbaş herwisa diyar kir ku darizandina siyastmedar û çalakvanan bi rengekî bêgirtin jî di van salên dawî de zêde bûye. Her çende jimareke fermî nîne lê nêzî 500 hezar kesî -ku ji nîvî pirtir Kurd in- li malên tên darizandin.

### Işkence û qirkirina sîstematîk

### Di 10 salan de 2 milyon giliyên binpêkirinan li girtîgehên AKP-MHPê

Tê gotin tevî destgîrkirinê, rêjima AKP-MHPê şêwaz û rêbazên herî qirêj û dermirovê li girtîgehên xwe dimeşîne. Li gorî raporeke kevin ku ji aliyê Cemza Akoş ya ser CHPê berî niha belav bûbû, di 2010an de 17.280 gilî li dijî binpêkirinên li girtîgehên Tirkiyê pêk hatibûn, hatin pêşkêşkirin. Ev jimara giliyan di dawiya 2019an de gihîşt 319 hezar 807an. Di nava 10 salan de jî nêzî 2 milyon giliyî li ser heman binpêkirinan hatine pêşkêşkirin.

### Di salekê de 38 kes bi işkenceyê hatin kuştin

Li aliyekî din li girtîgehên AKPê girtina îfadeya girtiyan bi zorê û kuştina di binê işkenceyê de zêde bûye. Li gorî Saziya MAITê ya Mafê Mirova sala 2020an tenê 38 kesî ji ber işkenceyê jiyana xwe ji dest daye.

### IHD: 59 kesan ji ber rewşa tenduristiya xerab jiyana xwe ji dest da

Herwisa li gorî Komeleya Mafê Mirovan (IHD) 59 girtiyên nexweş di 2020an de ji ber şertûmercên giran yên tendurstiyê di girtîgehên AKP-MHPê de jiyana xwe ji dest dane. Herwiha 1605 girtî xwedînexwşiyên giran in û rewşa wan pir xerab e ku ji wan 604 kes di rewşeke pir xeter de ne.

### `Sîstemeke işkençeya derûnî û fîzîkî bi ser girtiyan de hatiye sepandin`

Parlementarê HDPê Dogan Erbaş diyar kir ku di vê dema dawî de rewşa girtîgehan pir xerab e û desthilatê sîstemeke işkençeya derûnî û fîzîkî bi ser girtiyan de sepandiye û ev agahî da : "Girtiyên ku rewşa wan ya tenduristî ji ber vê sîstema işkenceyê xerab û dijwar dibe wan dibin nexweşxaneyê. Nexweşxane di raporên xwe de diyar dikin ku rewşa van girtiyan ne ya girtinê ye û mafê wan yê berdanê heye. Li gorî zagona Tirkiyê ya niha jî biryara dawî ya saziya Tiba Edlî ye. Lê Tiba Edlî li gorî qanûn û rapora nexweşxaneyê tev nagere. Tersî wê bi biryareke siyasî tev digere û bi ti şertûmercan ti kesan azad nake."



### `Ji ber sîstema işkenceyê di nava mehekê de 5 kesan jiyana xwe ji dest daye`

Erbaş diyar kir ku di nava mehekê de 5 girtiyên Kurd ji ber sîstema işkenceya avabûyî jiyana xwe ji dest dane û axafina wiha qedand: "Me dît ku berî çend rojan, Garîba Gezir, işkence lê hatiye kirin û di encamê de jiyana xwe ji dest da. Tevî rapora fermî nehatiye weşandin, lê desthilat idîa dike ku bûyer xwekuştin e. Her 5 kesên jiyana xwe ji dest dayîn tev nexweş bûn. Li gorî saziyên Mafê Mirovan û raporên nexweşxaneyan diviya bên berdan. Lê desthilat van rapora red dike."

## Dem hatiye ku pehîn li Erdogan bê xistin



**Zekî Bedran**

Erdoganê faşîst Tirkiye xist rewşeke pir xirab. Şerê li dijî Kurdan didomîne bû sedem ku welet bikeve krîza aboriyeke giran. Erdogan her tişt xist destê xwe û bingehê dîktatoriyeke faşîst danî. Hikumeta faşîst ne ji bo gelê xwe tenê, bû belaya serê dinyayê jî. Digel ku bîst sal in desthilat e bi kursî ve zeliqiye.

Dinyayê tevê destê xwe ji DAIŞ, El Nusra û bermayiyên wan kişand. Lê Erdogan ev hêzên çekdar ku bi dehhezaran in xistine binê parastina xwe. Ji Libya heta Azerbeycanê ev hêz ji bo şer şandine gelek deverên dinyayê. Ewropa jî di navê de dinyayê bi koçberan û terorê tehdîd dike. Bi standina S 400 ji Rûsya têkiliya bi NATO û Amerîka re ne xweş kirin. Ixwanî xistin bin perê xwe û welatên Rojhilata Navî û weletên erebî tehdîd kirin. Bi spîkirina pereyên reş û trafîka tiryakê li cîhanê teşhîr bû. Dinyayê tevê jê daye stû.

Niha jî Tirkiye xistiye nava xizaniyeke giran û krîza aboriyê. Li dinyayê û li herêmê her kes dixwaze ji Erdogan rizgar bibe. Di hilbijartineke bê kirin de şansê wî yê serketinê jî nemaye. Lê ji ber ku dizî û sûcên kirîn mezin in xwe bi kursiyê desthilatiyê ve zeliqandiye û naxwaze dev jê berde.

Li Tirkiyê mûarede her ku diçe xurttir dibe. Gelê Kurd bi giranî li hemberî vê desthilata faşîst e. Erdogan hatiye rewşeke wisa ku bi hemleyekê serûbin bibe. Lê hêzên weke Amerîka û Ewropa hê dixebitin ku Erdogan rizgar bikin û temenê wî dirêj bikin. Wiha dihizirin: Ji bo ku Erdogan pirtir nebe bela, zererê nede em nikarin di rûyê Erdogan de Tirkiyê ji çavê xwe derxin. Dibe ku wateyek vê hebe lêbelê pirsgirêk ji zû ve ji van mijaran derbas bûye. Parastina kesekî ku li hundir û derve nayê xwestin û bela û pirsgirêkan diafirîne herêmê û dinyaê ji rewşa ewleyî derdixe.

Her kes dibîne ku Erdogan niha li qaşilê zebeş vedigere û stûyê xwe li ber dewletên erebî xwar dike. Lê sedemek nîne ku dewletên erebî têkiliyên xwe bi vî faşîstî re baş bikin. Yên di zorê de ne Ereb in. Yê dixwaze têkiliya xwe bi Misir, Îmaratên Erebî û Siûdiyan re xweş bke Erdogan e. Dixwaze navbera xwe û Israîl jî xweş bike. Çend dolarên ji Ereban werin wê ji bo wî bibe ava heyatê. Li hundir rewşa aborî xirab e. Baş e ji bo çi nûnerên Îmaratê diçin Enqere. Soza deh milyar dolarî didin. Pêwîstiya Îmaratê bi tişteke wisa nîne. Niha nûçe tên ku dixwaze bi navcîtiya Qeterê navbera xwe û Siûdiyan xweş bike.

Îmarat û Siûdî dizanin ku bê Amerîka nikarin gaveke wisa biavêjin. Baş e çima Amerîka dixebite ku temenê Erdogan dirêj bike? Yewnanistana endama NATO jî di binê gefa Tirkiyê de ye. Ji bo pêşîgirtina vê Amerîka neçar ma hêzên xwe li Yewnanistanê bi cî bike. Di gel van tevan Amerîka hêviya çi ji Erdogan dike? J. Biden ji Tirkiyê nerihet e ku venexwend civîna demokrasiyê. Me berî niha jî gotibû bi taybetî ji ber rola xirab ya ku li Sûriyê dilîze divê Amerîka û Rûsya piştgiriya Tirkiyê nekin. Dewleta tirkî her roj gefan li gelên Rojava û Sûriyê dixwe. Di rewşekê de ku her kes dixwaze şer biqede, Erdogan amadekariya komkujî û dagîkeriyeke nû dike. Me gotibû Erdoganê ku li hundir û derve hêza xwe winda kiriye û sûcên wî diyar bûne, li şûna ku hûn wî rizgar bikin û temenê wî dirêj bikin hûn jî pehînekê lê bixin da gelên herêmê bîna xwe bistînin. Ne dirêjkirina temenê Erdogan qewitandina wî di berjewendiya her kesî de ye.

Wêraniyeke mezin hat serê gelên Sûriyê. Niha jî ketine nava xizan û pirsgirêkên aborî yên pir giran. Tirkiye Rûsya û Amerîka bi kar tîne û dixebite ji xirabiyên xwe re zemîn çêke. Bi alîkariya Rûsya û Amerîka li Efrîn û Serê Kaniyê yên dagîr kirîn qirkirina neteweyî dike. Çeteyên xwe yên çekdar berdan ser serê gel. Li wan herêman talan, destdirêjî û işkence bûne parçeyên jiyana rojane. Amerîka û Rûsya van baş dizanin lê ji bo berjewendiyên xwe dengê xwe nakin.

Her kes mereq dike ka ji bo çi Amerîka dixwaze dîktarokerekî wiha xwînrêj li ser piyan bigire. Sûcdarekî evqas lewaz bûyî ne rizgarkirin, dema qewitandina wî bi pehînekê ye. Heta ku hêzên weke Amerîka destekê bidinê wî Erdogan li ber xwe bide û xirabiyên xwe bidomîne.